# Bin Desthilatiya Kurd:
# Îstîsmarên li Deverên Destê PYD li Suriyê

## Kurtasî

Di van du salên derbasbûyî de, Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD), ku partiyeke siyasî ye li Suriyê û ji Partiya Karkerên Kurdistanê ya li Tirkiyeyê derketiye, rêveberiyeke fîilî pêk aniye li sê deverên piranî Kurd lê dijîn li bakur û rojhilata bakurê Suriyê: Efrîn, Kobanî û Cizîr. Meha Çilê ya sala 2014´an de, PYD û şîrikên din rêveberiyeke derbasbûnê damezirandin di van her sê deveran de. Konseyên mîna wezaretan pêk anîn li gel dadgeh û hêzên polîs û makeqûneke nû çêkirin.

Baskê çekdarî yê PYDê, Yekîneyên Parastina Gel (YPG) ewlehiya derveyî diparêze di van her sê deveran de, û di nav şerekî çekdarî de ye li dijî komên îslamî yên ne-dewletî, serî de jî Cepheya El Nusra û DAÎŞê.

Ev rapor birrek îstîsmarên mafên mirovan qeyd dike li van deverên bin kontrola PYDê, nexasme li ser devera Cizîrê disekine ku Çavderiya Mafên Mirovan çûye serdanê di meha Reşemiya 2014´an de. Rapor ser girtinên keyfî, îstîsmarên bin çavan de, nerastiyên daraziyê û revandin û kuştinên nezelal, û her wiha bikaranîna zarokan di hêzên ewlêhiyê yên PYDê de hûr dibe. Rapor, nakeve nav nîqaşa astengiyên behs lê tê kirin ku bi destê berbirsiyarên desthilatiya PYDê çêdibin derbarê azadiya axaftin û sazîbûnê, an jî neheqiyên dijî civakên van deveran, yên ne-kurd. Beşa paşxaneyê kurtasiya îstîsmarên komên îslamî yên ne-dewletî dide li van deveran.

Ji sala 2011´ê ve Çavderiya Mafên Mirovan îstîsmarên mezin yên bi destê hikumeta Suriyê û kiryarên (aktorên) ne-dewletî pêk hatine qeyd dike ku hinekê wan sucdariyên şerê û yên dijî mirovahiyê ne. Her çiqas îstîsmarên mafên mirovan bi destê PYDê û hêzên wê yên ewlehiyê gelekî kêmtir jî bin ji aliyê xirabî û berfirehî ve, dîsa jî girîng in. Wekî desthilatiya fîilî, PYD mecbur e mafên bingehîn ên mirovên li deverên bin kontrola xwe de dijîn - yanî kurd, ereb, sûryanî û yên din - pesend bike li gorî mafên mirovan ên navneteweyî.

Nexasme jî destengkirin û girtinên keyfî yên dijberên kurd ên siyasî yên PYDê mijara xema vê raporê ye. Rapor nîşan dide ku di gelek nimûneyan de hêzên ewlehiyê yên PYDê kesên girêdayî partiyên kurd ên muxalîf, wekî Partiya Demokrat a Kurd li Suriyê (PKDS), Partiya Yekitî û Partiya Azadî, keyfî hatine binçavkirin ji ber xebatên xwe yên aştiyane li dijî PYDê. Çavderiya Mafên Mirovan gelek tawanbariyên zexm ên vî rengî bihîstine. Heçî PYD be qebûl nake ku girtiyên siyasî destê de ye û dibêje kesên em behsê dikin hatine girtin ji ber lebatên sucdarî, mîna danûstandina dermanên kêfdêr (drug trafficking) û êrîşên bombeyî.

Meha Nîsanê sala 2014´an de, mehkemeyekê bi destê PYDê tê rêvebirin li Efrînê ceza da 13 kesan, 5ê wan endamên PDKSê bûn û bi hinek êrîşên bombeyî dihatin tawanbarkirin di dozeke de ku mirov digot ne hevaheng bû li gel standartên navneteweyî. Diyar bû ku dadgeran ceza dabû wan kesan tenê ser mikurhatinên wan, lê guh nedan gazindên ku digotin ev mikurhatin di bin îşkenceyê de hatibûn standin.

Ji xeynî şerê bo desthilatiyê nav kurdan bi xwe de, rêbaza daraziyê bi destê PYDê xweyî hin pirsgirêkan in ku binê mafên ji bo rastiyên daraziyê û dozên heqanî vala dikin. Derveyî van mînakên ji aliyê siyasî ve berbiçav, Çavderiya Mafên Mirovan rastî derqanûniyên dijî şexsan hat ku ji ber sucdariyên gelemperî hatibûn girtin. Li gorî wan kesên ku hatine girtin an jî nasên wan, polîs, bi navê xwe yê pê tê zanîn Asayîş, piranî beyî ku delîlekê nişan bidin mirov girtine. Kesên hatibûn girtin an nizanibûn ku mafê wan heye ji bo girtina parêzerekê an jî perê wan tunebû ji bo vê yekê. Ev yek li gotinên berbirsên herêmî hev nagirin ku dibêjin heqê mafê parêzerê didin girtiyan di gavê de. Girtiyên niha û yên berê jî gazind dikirin ji ber dirêjiya wextê ku di bin çavan de dihatin girtin berî ku derkevin pêşberê dadgerekê lêpirsînê, du mînakan da ji mehekê zêdetir bû ev wext.

Hewldaneke PYD a guherandina qanûnên Suriyê rêbaza dadê (edeletê) tevlihev kiriye. Her çiqas hinek qanûnên Suriyê cudageriyê li kurdan bikin an jî derkevin derveyî standarên din ên mafên mirovan jî, guherandin bi avayekî bêserûber û nezelal pêk tên; ev yek jî serê parêzer û girtyan tevlihev kiriye. Divê berpirsiyar qanûnên Suriyê biguherînin tenê ji bo ku ev guherandin li gorî qaîdeyên navneteweyî yên mafên mirovan bin. Hemû guherandinên di qanûn, qaîde û rêzikên Suriyê yên heyî de divê yekser werin çapkirin û belavkirin.

Makeqanûna nû ya di meha Çileya 2014´an de hatiye pejirandin, ku wek Hevpeymana Civakî tê binavkirin, hevaheng e bi hinek standardên girîng ên mafên mirovan, lê belê hinek prensîbên bingehîn piştguh dike, wekî qedexekirina binçavkirina keyfî, venêrîna darazayî ya rêkûpêk, û mafê girtina parêzerekê di

lêpirsîna cezayî de. Lê tevî van, pêşdeçûneke erênî ye di hevpeymanê de ku bikaranîna dardekirinê qedexe dike.

Gotara 25ê ya Hevpeymana Civakî îstîsmara fîzîkî û derûnî ser kesên girtî qedexe dike. Lê belê hinek girtiyan gotin Çavderiya Mafên Mirovan ku endamên Asayiş û YPGê li wan xistine û tu caran jî cezayek negirtine ji ber van lêxistinan. Çavderiya Mafên Mirovan nekarî îstîsmara girtiyan bi avayekî berfireh bibîne li deverên bin kontrola PYDê, lê delîlên hatine berhevkirin nîşan didin ku îstîsmarên vî rengî çêdibin û du rûdanên demek berê pêk hatine bi mirinê xilas bûne.

Meha Gulana 2014´an de, mêrikekî 36-salî jiyana xwe ji dest di bin nezarata Asayîşê de li Efrînê. Asayîşê got ku mêrikî serê xwe li diwarê xistiye û xwe kuştiye, lê belê kesekî ku leşê wî dîtiye got ku birînên wî - hinek cihên zêde şewitiye derdora çavên wî û birîneke kur li pişt stuh heye- baweriyê nadin ku ewî bi xwe serê xwe li cihekê xistiye. Reşemiya 2014´an de, Asayîşa Serê Kaniyê qebûl kir ku endamekî hêza wan girtiyekî 24-salî kuştiye. Asayîşê û malbata wî mirovî hatiye kuştin gotin Çavderiya Mafên Mirovan ku berpirsiyar hatin darizandin û cezakirin bi “girtina bêsinor li gel karê zehmet” ji ber kuştinê.

Li Cizîrê, Çavderiya Mafên Mirovan çû serdana du girtîgehên navdeng ên tên bikaranîn - li Qamişlo û Dêrikê. Hepsa Qamişloyê de 17 girtî hebûn ji ber cezayên cuda ên gelemperî, hemû jî mêr bûn. Di hepsa Malikiye de 15 kes hebûn ji ber birrek sedemên nêzî hev, du ji van jin bûn.

Girtiyên di van her du hepsan de behsa şert û mercên kamil kirin: girtiyan gotin ku rojê sê dan xwarin wergirtine û herî kêm carekê derketine sporê û karîne herin bijîşk hekê hewce bike. Du jinên li girtîgeha Malikiye di odekê cuda de hatine girtin, lê belê di herdû girtîgehan de jî mêr bi hevra bûne çi ji ber sucên piçûk çi yên mezin hatibine girtin.

Li gorî agahiyên Asayîşê dane Çavderiya Mafên Mirovan, 4ê meha Gulana 2014´an de, destê wan de 130 kes hebûn li hepsa Efrînê û 83 kes jî hepsa Serê Kaniyê bûn. Çalakvanên muxalîf û hinek parêzer li Efrîn, Serê Kaniyê û Cizîrê gotin ku hepsên veşartî jî hene destê berbirsiyaran de, lê belê Çavderiya Mafên Mirovan nekarî van tawanbarkirinan piştrast bike. Asayîşê qebul nekir ku girtî li hinek cihên din hatibin girtin.

Herî kêm neh rikûberê PYDê ên siyasî hatine kuştin an jî windakirin nav du sal nîv de li deverên ku temamî an jî heta radeyekê bin destê PYDê de ne. PYDê tu berbirsiyarî

qebûl nekir, lê belê tunebûna lêpirsînên heqanî berevajiyê bersiva polisan nişan didin piştî rûdanên din ên ewlehiyê, mîna girtina gelek kesan piştî piraniya êrîşên bombeyî.

Sala 2013´an de YPG û Asayîşê soz dabûn ku ew e zarokên ji 18 salî piçûktir bikar neynin ji bo karûbarên çekdarî, lê belê Çavderiya Mafên Mirovan dît ku hêj jî bikar tînin.

Reşemiya 2014´an de, Çavderiya Mafên Mirovan du endamên çekdar ên Asayîşê dîtin li Cizîrê, digotin 18 salî piçûktir in, du yên din jî wisa xuya dikirin ku ji 18 salî piçûktir in, lê fermandarên wan ji wan xwast ku temenê xwe nebêjin. Her wiha, Çavderiya Mafên Mirovan hevpeyvîn çêkir bi kurikekî 16 salî ku sala çûyî beşdarî YPGê bûbû. Du kesên din jî got ku van dawiyan de zarokên ji malbata wan beşdarî YPGê bûne.

Rêziknameyên navxweyî yênpi hem Asayîşê hem jî yên YPGê bikaranîna zarokên 18 salî piçûktir qedexe dikin (binêrin pêvek II û III). Qanûna navneteweyî dibêje temenê herî piçûk 18 e ji bo beşdarbûna kesan nav şer de, bikaranîna zarokan wek rêçger, qasîd û li cihên kontrolê jî nêv de.

Pêşdeçûneke erênî ye ku 5ê Xezîranê, YPG bi avayekî eşkere qebûl kir ku pirsgirêk didome û soz da ku dê hemû şervanên ji 18 salî piçûktir ji nav hêzên xwe derxe di nav mehekê de.

Çavderiya Mafên Mirovan, her wiha, 27ê Xezîranê li Amûdê bûyerên tund kola, dema hêzên YPG tundiyeke zêde bikaranîn li dijî çalakvanên dij-PYD, gule hatin reşandin ser sê mêra û ew hatin kuştin. Wê şevê hêzên parastinê 2 mêrên din jî kuştin di gengeşiyên şûlû (nezelal) de, rojtira din yekî din jî hat kuştin. Şeva 27ê Xezîranê, YPG qasî 50 endam an jî alîgirên Partiya Yekitî ya muxalîf keyfî binçav kirin li Amûdê û di navendeke leşkerî de li wan xistin. Divê YPG û berpirsên herêmî lêpirsînekî serî heta binî serbixwe bi rêve bibin derheqê vê bûyerê de û kesên bi avayekî keyfî mirov bin çav kirine, li wan xistine û tundiyeke zêde bikar aniye ser wan ceza bikin.

Berpirsên sereke yên YPGê çendîn cara gotine ku partî û rêveberiyên herêmî girêdayî mafên mirovan in. Hevpeymana Civakî ya makeqanûnî dibêje ku rêzik û hevpeymanên mafên mirovan ên navneteweyî beşeke giring in di hevpaymana wan de. Her wiha PYDê destûr da Çavderiya Mafên Mirovan ji bo ku li devera Cizîrê bigerin û çavderiyan bikin, herin du girtîgehan û bersivê pirsên xwe bikarin bigirin hem bi devkî hem jî nivîskî.

Digel van soz û tevdanan, derqanûniyên mafên mirovan li deverên bin kontrola PYDê hêj jî didomin. Her wekî beşa hiquqî ya vê raporê jî bi zelalî nîşan dide, PYD, wek desthilata fiîlî li Efrîn, Kobanê û Cizîrê, mecbur e rêz bigire mafên mirovan.

Ji bo ku ev kêmasi werin rastkirin, Çavderiya Mafên Mirovan birrek gavan pêşniyaz dike. Ji bo dozên girtiyên siyasî ji nû ve werin vekolîn komîsyoneke serbixwe pêk were, û her keseke ku bê belasebeb hatibe binçavkirin were berdan. Divê dezgeheke aşkere were damezirandin ji bo girtiyan ku îstîsmarên di dirêjiya binçavkirin, lêpirsîn û girtinê de werin qeydkirin, paşî jî di mehkemeyên rêk û pêk de doz were vekirin li wan kesên mesûl. Divê ev mehkeme li hev bin bi qanûnên Suriyê û werin hevahengkirin li gorî standardên navneteweyî yên mafên mirovan li cihê ku hewcedarî pê hebe. Hemû guherandinên di qanûnên Suriyê de divê yekser werin çapkirin û belavkirin. Divê Asayîş û YPG ji bo karûbarên çekdarî wergirtina kesên 18 salî piçûktir rawestîne, li cihên kontrolê (checkpoint) û navendên leşkerî jî nêv de.

## Pêşniyaz

### Ji bo Rêveberiya Demkî ya Derbasbûnê

Binçavkirinên Keyfî

- Divê komîsyoneke ser-partiyan û serbixwe were sazkirin ji bo ku dozên kesên girtî ên ser zemîneke siyasî ji nû ve werin vekolîn. Divê kesên tê gotin ku bê belasebeb hatine binçavkirin werin berdan, kesên tenê ji bo xebat û çalakiyên netund ên siyasî hatine girtin jî nêv de.

Nerastiyên Daraziyê

- Divê binçavkirina kesan tenê bi delîleke ji dozger hatiye wergirtin çêbe;
- Divê di gavê de hemû kesên ku hatine binçavkirin werin agahdarkirin ji bo sedema binçavkirinê;
- Divê bi lez û bez mafê girtina parêzerekê were dayîn ji bo girtiyan;
- Divê teqez hemû girtî werin derxistin pêşberê dadger di mehkemeyên rêk û pêk de, û an werin girtin an jî berdan;
- Divê wê mafê bidin kesan ku derkevin daraziyên heqanî di mehkemeyên serbixwe û rêk û pêk de;
- Divê bihêlin rêxistinên herêmî û navneteweyî yên mafên mirovan ku çavderiya dozan bikin.

Îstîsmarên Binçav de

- Divê lêpirsîn were vekirin ji bo îxbarên bawerpêkirî yên derbarê îstîsmarên di bin çav de û ceza bidin wan kesên berpirsiyariya wan heye;
- Divê dezgeheke aşkere were damezirandin ji bo girtiyan ku serî lê bidin ji bo gazindên xwe yên derbarê neheqî û îstîsmaran de di dirêjiya binçavkirin, lêpirsîn û girtinê de;
- Divê dadger bi avayekî hişyar guh bidin gazindên girtiyan derbarê neheqiyên li wan hatine kirin di bin çav de û van bişînin dezgeha dozger ji bo lêpirsîneke lez, berfireh û serbixwe;
- Divê destûr hebe ji bo rêxistinên herêmî û navneteweyî yên mafên mirovan ku çavdêriya bikin li cihên girtiyan, girtîgeh û navendên Asayîşê jî nêv de.

Guherandinên Yasayî

- Divê guherandinên di qanûn, qaîde û rêzikên heyî de hevaheng bin bi standardên navneteweyî yên mafên mirovan, û yekser werin çapkirin û belavkirin;
- Divê danezanek were weşandin ji bo ku zelal bike qanûna Suriyê lê ye, tê guhertin ji bo bibe hevaheng bi standardên navneteweyî yên mafên mirovan.

Şer û Mercên Girtîgehan

- Divê kesên ji bo sucdariyên piçûk hatine girtin an jî cezakirin cuda werin girtin ji wan kesên ku ji ber sucdariyên mezin hatine girtin, nexasme jî ji ber sucdariyên tundiyê;
- Divê dezgehek were damezirandin ji bo çavderiyeke daîmî li navendên girtiyan - girtîgeh û navendên Asayîşê - bi destê çavderên serbixwe.

Windabûnên û Kuştinên Nezelal

- Divê bi lez û bez û bi avayekî serbixwe hemû windabûn û kuştin werin lêpirsîn beyî ku li pêwendiyên siyasî yên kurbanî were nêrin;
- Divê were aşkere kirin her çi hatibe kirin ji bo lêprisîna windabûn û kuştinên nezelal a xebatkarên siyasî û endamên partiyan.

Leşkerên Zarok

- Divê bikaranîna zarokên ji 18 salî piçûktir ji bo karûbarên çekdarî di Asayîş û YPGÊ de were rawestandin. Cihên kontrolê û navendên leşkerî jî nêv vê de ye;
- Divê hemû perwerdehiyên leşkerî ji bo zarokan were rawestandin;
- Divê raya giştî were agahdarkirin ka çend zarok ji Asayîş û YPGê hatine derxistin û çi tê serê van zarokan;
- Divê berpirsên Asayîş û YPGê yên ku dihêlin zarok bin wan de bixebitin werin perwerdekirin;

- Divê wergirtina leşkerên zarok li navendên ciwanan an jî çandî were qedexekirin, û kesên wan werdigrin werin perwerdekirin;
- Divê hevkarî were kirin bi saziyên navneteweyî ji bo rehabilitasyona endamên zarok ên berê di Asayîş û YPGê de cih girtibûn, û piştgirî were dayîn ji bo lihevanîna wan a nav civakê de.

Xwepêşandana Amûdê

- Divê lêpirsîneke bawerpêkirî û serbixwe were vekirin derbarê bikaranîna tundiya zêde di xwepêşandana li Amûdê 27ê meha Xezîrana 2013´an, û lêxistina li girtiyan piştî vê xwepaşandanê bi destê YPGê.
- Divê endamên YPGê yên tundiyeke zêde bikar anîye û îstîsmara girtiya kiriye mesûl werin dîtin.

Hevkariya Navneteweyî

- Divê hevkariyeke dorfireh were kirin li gel Neteweyên Yekbûyî Komîsyona Serbixwe ya Navneteweyî ji bo Lêpirsînê li Suriyê û Lijneya Navneteweyî ya Xaça Sor.